

STADT WOLFSBURG

STADTRÄTIN

Dezernat für Bildung, Jugend und
Integration



STADT WOLFSBURG · POSTFACH 10 09 44 · 38409 WOLFSBURG

Ji hemî **Dêûbav/Welîyên qanûnî** yên
xwendekaran li Dibistanên
Wolfsburgê

ADRESSE
Stadt Wolfsburg
Porschestraße 49
38440 Wolfsburg

ÖFFNUNGSZEITEN
Du. 08:30 – 16:30 Saet
Sê. 08:30 – 16:30 Saet
Çar. 08:30 – 12:00 Saet
Pênc. 08:30 – 17:30 Saet
În. 08:30 – 12:00 Saet

AUSKUNFT ERTEILT
Tîma Pêşveçûna Dibistanê
Tel.: 05361 28 – 1153
Faks: 05361 28 – 2252
schulentwicklung@stadt.wolfsburg.de

IHR ZEICHEN/SCHREIBEN VOM
Zeichen/Datum

MEIN ZEICHEN/SCHREIBEN VOM
Zeichen/Datum

12.09.2022

Lêkolînek li ser rewşên dibistanên Wolfsburg di dema pandemiya Covid-19 de

Dêûbav û welîyên hêja,

du salên derbasbûyî me hemûyan bi çetinahiyên mezin re mijol bûn. Mîna hemû qadên jiyane, pandemiya koronayê bandorek mezin li ser dersên dibistanan kir. Hem zarokên we û hem jî hûn wekî dêûbav ji fêrbûna dûr û xwendina nav malê, barek giran dîtîye.

Em dixwazin zanibin ka hûn û zarokên we, vê çaxê çawa derbaz kir – û hîn jî tecrîbe dikin. Ji ber vê sedeme, em niha li dibistanên Wolfsburgê lêkolînekê çê dikin. Em bi xwendekaran, dêûbavên wan, rêveberiya dibistanê, û mamosteyan re hevpeyvîn çê bikin.

Bi beşdarbûna di vê lêkolînê de, bi serpêhatiyên xwe û yên zarokên we, hûn ji me re dibin alîkar ku em bi başî di vê rewşê de bixebitin, û pêşveçûnên erênî û her wiha dijwarî û hewcedariyên başkirinê destnîşan bikin. Encamên lêkolînê bi dibistanên Wolfsburgê û bi siyasetmedaran re, wek nimûne, di Komîteya Dibistan û Perwerdehiyê de, werin nîqaş kirin, û di pêşveçûna bêtir a hevbeş a siyaseta perwerdehiya Wolfsburgê werin bikar anîn.

Hûn ê dikarin lêkolînê (Girêdan, Şifre) li ser rûpela agahdariyê ya pêvekîrî bibînin. Hûn û zarokên we dikarin bi eynî agahdariyên navketinê, di lêkolînê de beşdar bibin. Piştî qeydkirin, hûn dikarin pirsnameyê ji bo dêûbav an xwendekaran hilbijêrin.

Tijîkirina pirsnameyê dê bi qasî 10 hûrekan bikîşîne. Beşdarbûn heya 14.10.2022 mimkin e.

Sparkasse Celle-Gifhorn-Wolfsburg
IBAN DE56 2695 1311 0025 6098 92
BIC NOLADE21GFW

Volksbank BraWo
IBAN DE55 2699 1066 0844 8450 00
BIC GENODEF1WOB

Gläubiger-ID
DE 65WOB00000030809

USt.-IdentNr.
DE115235874

Heke hûn **razi bin, ku zaroka we ya biçûk beşdarî lêkolînê bibe**, ji kerema xwe, girêdan û şifreya xwe ji bo beşdarbûnê bidin zaroka/ê xwe. Bi vê yekê, hûn razîbûna xwe ji bo beşdarbûna zaroka/ê xwe û karanîna daneyan ji bo armanca diyarkirî, piştrast dikin.

Dêûbavên hêja, ji kerema xwe, bi taybetî piştgirî bidin zarokên xwe yê herî biçûk: Heke hewce be, vebijarkên pirs û bersivan ji zarokên xwe re bixwînin û di nivîsandina bersivan de piştgirî bidin wan.

Xwendkarên di temenên qanûnî de:

Ew name ji bo şandin ji dêûbavan re li hemî xwendkaran re tê belavkirin, çî xwendekar biçûk be an mezin be.

Ji ber vê yekê, ji kerema xwe girêdan û şifreya xwe ji keç an kurê xwe yê mezin re derbas bikin da ku ew beşdar bibin. Gelek spas.

Heke çend zarokên we yê dibistanê hene:

Hûn ê ji bo her zarokeka dibistanê ku lêkolîna di pola wî/wê de tê kirin nameyek veqetandî bistînin. Hûn dikarin ji bo her zarokekî cîhê cîhê beşdar bibin, da ku em karibin di astên polên cuda û formên dibistanê de li rewşê binêrin.

Beşdarbûn di lêkolînê bi dilxwazî û anonîm e. Kî beşdarî lêkolînê bûye, naye peyda kirin.

Heke hûn an zarokê we nexwazin beşdar bibin, ti kêmasiyan bi xwe re nagire. Her weha hûn dikarin bersivên cuda bidin, pirsê di her kêliye de derbas bikin, an jî lêkolînê bi tevahî betal bikin an biqedînin.

Mixabin, pirsname tenê bi Almanî ji bo xwendekar û dêûbavan hene.

Heke pirsên we li ser vê lêkolînê hebin, ji kerema xwe re têkilî daynin bi:

Stadt Wolfsburg

Geschäftsbereich Schule

Abteilung Steuerung, Entwicklung, Qualität

Tel. 05361 281153

An jî bi rêya e-Name li: schulentwicklung@stadt.wolfsburg.de

Gelek spas ji bo piştgiriya we!

Rêz û Rûmet



Iris Bothe
Stadträtin